Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar :745 21-Adar- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî


# Ji ber vîrûsa Koronayê divê tedbîrên pêwîst bên girtin



Aloziya vîrûsa Korona roj bi roj li cîhanê kûrtir dibe. Jimara kesên ji ber vî vîrûsê dimirin heta sêşema borî 4 hezar û 26 bû. Ji aliyû din ve jimara kesên bi vê vîrûsê ketine gihat 114 hezar û 452'yan.
Vîrûsa Korona (Covîd-19) Kanûna 2019'an li bajarê Wohan ê Çînê derket. Bi lez û bez

**Desteya Tenduristiyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê got heta niha vîrûsa Korona li herêmê nehatiye dîtin. Bijîşkên pispor jî ji ber vê nexweşiyê hişyarî dan û gotin divê welatî xwe biparêzin û tedbîrên hişyariyê bînin cih.**

li derveyî Çînê belav dibe. Li gorî daneyên fermî ev vîrûs li 118 welatan belav bûye.
Hevserokê Desteya Tenduristiyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ciwan Mistefa diyar kir ku heta niha vîrusa Korona li Bakur û Rojhilatê Sûriyê nehatiye dîtin.
Dr. Ciwan Mistefa jî diyar kir ku Desteya Tenduristiyê gelek tedbir girtine, mîna girtina deriyên sînor û got, nabe ku kesek ji welatên nexweşî li wan peyda bûyî derbasî herêmê bibe.
Dr. Ciwan Mistefa da xuyakirin ku Desteya Tenduristiyê gelek tedbîrên hişyariyê girtine û got, kesên derbasî herêmê dibin, bi awayekî giştî tên fehiskirin (dezenfektekirin). Desteyê navendên kontrolkirina vîrusê li 7 herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê wek tedbîr amade kirine.
Girêdayî girtekên parastinê pisporê nexweşiya singê, Dr. Ebdulxenî Silêmanjî wiha got: "Ji girîngtirîn gavên pêwîst, parastin û bicihanîna girtekên hişyariyê ne. Mîna dûrketina ji kesên bi sermayê ketîn. Tevî ku pêwîst e ew nexweş di hundir de heta 14 rojan bimînin."
Dr. Silêman got, pêwîst e kesên bi sermayê ketîn lepik û kemame (maskan) bi kar bînin da nexweşiya xwe belav nebe. Her wiha diyar kir ku vîrusa Korona giran e û heta 3 metreyan tene ji erdê bilind dibe. Ji ber wê divê maseyên cihên kar her tim werin paqijkirin, divê dest 20 saniyan werin şûştin."
Dr. Silêman herwiha got, divê nexweşên dil, şekir û kulbûna sîng tedbîrên zêde bigirin, lewre asta bergiriya laşê wan zeîf e."

## Rêbaza herî girîng ya xweparastina ji vîrusê, parastina şexsî ye




Dr. Ebdulxenî Suleyman diyar kir tedbîrên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo pêşîgirtina li belavbûna vîrusa Koronayê li herêmê digire, yên giştî ne û divê pêk werin û got, parastina şexsî parastina herî girîng e.

Pisporê nexweşiya sing Dr. Ebdulxenî Suleyman bal kişand ser parastina şexsî û wiha got: "Parastina şexsî parastina herî girîng e, mîna şûştina destan bi av û sabûnê bi dema 20 saniyeyan dem bi dem, çêkirina xwarinê bi taybetî goşt û hêkan bi awayekî baş, dûrxistina ji kesên biguman, dûrketina ji cihên zemhet."
Desteya Tenduristî û Şandeya Aloziyê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê tedbîrên pêşîgirtina li belavbûna vîrûsa Koronayê li herêmê pêk tînin. Herwiha gelek biryarên parastinê (mîna paşxistina dewama dibistan û zanîngehan, rawestandina kombûn, girtina qehwexane û klûban, dezenfektekirina sazî û cihên giştî) girtin.
Dr. Ebdulxenî got, pêwîst e kesên bi sermayê ketîn serdana bijîşkan bikin û rewşa xwe paşguh nekin.
Li aliyekî din jî aliyên pêwendîdar ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê xebata pêşîgirtina li vîrûsa Koronayê wek belavkirina belavokên danasîn û hemleyên dezenfektekirinê li sazî û cihên giştî pêk tînin.
Ji şêniyên bajarê Qamişlo Silava Îbrahîm got, divê em biryarên Rêveberiya Xweser ragihandîn, pêk bînin. Mîna danîna maske û lepikan, paqijkirina destan û baldariya ji belavbûna vîrûsê li herêmên me."

## *Xelata wêneyê Diyarî malbata xwe ya koçber kir*

Rojnamevan û wênegir Rodî Seîd xelata wêneyê salê yê Reutersê yê sala 2019an girt. Di wêne de zarokek heye, di nava jinên DAIŞî de yên li Baxozê xwe radestî hêzên QSDê dikin. Ji nava çarşefên reş dîq dike. Jûriyê ev wêne wek wêneyê herî bibandor yê salê hilbijart.

Ronî Seîd ê ji Serêkaniyê, ji merasîma eşkerekirin û dayîna xelatê re nameyek şand. Di nameyê de wiha dibêje: "Ji bo vî wêneyî bigirim, bi saetan rawestiyam û ji bo wê kêliya ku rûyê zarokê xuya bike ji nava wan çarşefên reş jî nîv saetê min xwe ji cihê xwe neleqand. Ji ber wê zarok hem di nava jinên bi çarşef de bû, hem jî rêzeke din a jinên bi çarşef li aliyê din bû ku siya wan dida ser wî. Lê axir, zarokê berê xwe da min. Kêliyeke ku sî nekeve ser rûyê zarokê min zeft kir.
Rodî Seîd di nameya xwe de weke din xelatê diyarî malbata xwe dike ku di demên ew ne li malê de tevî tirs û mitaleyan jî pişta wî girtiye, destek daye. Herwiha bîr dixe ku malbata wî jî ji Serê Kaniyê hatiye koçberkirin.




## Li Zelandaya Nû kûrtaj êdî 'ne sûc' e

**Li Zelandaya Nû kûrtaj heta niha 'sûc' bû, lê bi dengdana li parlamentoyê wê êdî wek pirsgirêka 'tenduristiyê' bê dîtin û karibe bê kirin.**

Di dengdana li parlamentoyê de, qanûnên li ser kûrtajê ku nêzî 40 salî ye nehatine guhertin, hatin guhertin. Pêşnûme li welêt ji bo hukmê li ser bedena xwe wek gaveke dîrokî hat dîtin. Bi 68 dengan li hemberî 51 dengî hat qebûlkirin.
Bi qanûna nû, wê jin bi 'pêşniyara doktoran' êdî bikaribin heta hefteya 20an ya ducaniyê mafê xwe yê kûrtajê bi kar bînin. Piştî hefteya 20'an pêwîst e test lê bê kirin û herî kêm du doktor bipejirînin.




## Maskeya xwe hûn bixwe çêkin!

Ji ber vîrûsa koronayê firotina maskeyan pir zêde bû. Vê jî wisa kir ku personelên tendiristiyê yên pê maskeyê hewce ne mexdûr bibin.

Ji bo ku li ser pergala tenduristiyê strêseke din çênebe, hûn dikarin maskeyên xwe çêkin. Li gelek welatên Ewropa welatiyan dest bi çêkirina maskeyên xwe kiriye. Ji bo parvekirina tecrûbeyan malperên civakî hatin çêkirin. Ev maske her çendî bi qasî maskeyên tibî ne bibandor jî bin lêkolînên ku hatine kirin maske tev partîkulên vîral kêm dikin.
Serwîsa Tenduristiyê ya Federal a Belçîkayê SPF Santê Publîque hin pêşniyar dan û mirovan baş dihemînin:

-Paçikên ji hev cihê ji yên yek qatî pirtir dihemînin.






## Agirê em pê bixin wê ruhê Newrozê zindî bihêle!

PAJK: Agirên ku em li ser banan û kolanên xwe pê bixin, wê ruhê Newrozê zindî bihêle. Divê gelê me di warê tendiruştiyê de xwe biparêze û teqez agirekî Newrozê pê bixe.*R-3*

## Perspektîfên Ocalan kilîta çareseriya aloziyan in



Şêxê êla El- Cewale Ebdurrehman El-Reşîd got, "Rêber Abdullah Ocalan xwedî nêrîn û fikrên ji tevahiya gelên herêmê re guncew in. Em bang li êl û eşîrên Ereb dikin ku roleke çlaktir bilîzin ji bo aloziyên herêmê çareser bikin û li hember dagirkeriyê li ber xwe bidin." ***R-4***


Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 745 21-Adar- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî




## Newroza we her xweş û geş be

Bi navê xebatkarên rojnameyê, di serî de gelê Kurd, em cejna gelên Rojhilata Navî pîroz dikin û hêvî dikin ku Newroza bê, bibe şahî û govenda gelan ya azadî, wekhevî û demokrasiyê. Herwisa ji bo rizgariya ji vê nexweşiya belav dibe, em hêvî dikin ku her kes guhê xwe bide biryarên Rêveberiya Xweser.

# Newroz Pîroz be

**Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê:**
Bi pêmana cejna Newrozê, ku gelê Kurd û gelên Mezepotamyayê ji bo wê şahiyan li dar dixin, em gelê xwe bi hatina vê cejnê pîroz dikin. Em wateya Newrozê di berxwedan, jiyan û azadiyê de dibînin, di heman demê de em soza xwe bi şopandina li ser riya dad, azadî û têkoşîna li dijî stemkarî û zordariya bi hezarê salan, nû dikin.






## Armanca koperatîfên jinan berfirehkirina rêgezên kolektîv e

Li navçeya Tirbesiyê ya kantona Qamişlo bi armanca piştgiriya aboriya civakî û belavkirina rêgeza kolektîv di kar de, gelek koperatîfên jinan hatin avakirin. ***R-3***



## 'Her birîndarê ku min derman dikir, kurê min Menan bû'

Serhatî û çîrokên lehengiyê, 58 rojên berxwedanê yên li hemberî dewleteke ku endama NATO'yê ye û doza girêdana bi welêt êdî bûye beşek ji jiyana şêniyên Efrînê yên ku neçar mane koçber bibin. Ji wan çîrokan yek jî ya Dunya Elûş e. ***R-6***



## Li ser qurbanên Helebce û Efrînê li Kerkûkê pêşangehek hat vekirin

Jinên Ciwan ên Têkoşer, bi pêmana bîranîna salvegera komkujiya Helebce û dagçrkirina Efrînê, li Bazara Şorçe ya Kerkûkê pêşangeheke wêneyan vekirin. ***R-7***

## Adar ji bo gelê Kurd hem şahî ye hem şîn e



Jina bi navê Fatma Fatê (61) her sal amadekariya 21'ê Adarê dike. Hem bi dilekî şad hem xemgîn diyar dike ku Newroz ji bo wê xwedî taybetmediyek mezin e û wiha dewam dike: "Meha Adarê hem şahî hem jî xemgîniya me derdikevin pêş. Herwiha mehên biharê jin xwedî semboleke girîng in. Jin û bihar yek in. Lewre jin bi xwezayê ve girêdayî ye, bi hatina biharê şa dibe." ***R-3***

# Rêveberiya Xweser biryara qedexeya derketina derve da

Hevserokatiya Meclisa Rêveber a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, di belavoka belav kirî de wiha got:
“Ji ber xetera vîrûsa Korona li ser cîhan û herêmê, ji bo parastina selametiya welatiyan, em ji tevayiya welatiyên herêmên Rêveberiya Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dixwazin van tedbîran bînin cih:

1-Qedexeya derketina derve li seranserê herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji sibeha roja Duşemê 23`yê Adarê ve, saet 6:00`ê sibehê dest pê dike.
2-Tevger û veguhestin di navbera rêveberiyên xweser û sivîl de û di navbera bajarên sereke de ji sibeha roja Şemî 21`ê Adara 2020`an ve saet 6:00`an sibehê tê qedexekirin.
3-Tevayiya xwaringeh, bazar, parkên giştî, iyadetên taybet, holên şahiyan û konên sersaxiyê tên girtin.
4-Ji vê qedexeyê tevayiya nexweşxane, navendên tenduristiyê yên giştî û taybet, rêxistinên navneteweyî, Xaça Sor, Heyva Sor, dermanxane, komînteyên pakkirinê, karkerên paqijiyê, firin, dikanên firotina madeyên xwarinê, erebeyên veguhestina madeyên xwarinê, şîrê zarokan, sahrîcên sotemenî derveyî qedexeyê ne.
5-Divê welatî tedbîrên hatîn bîrxistin bînin cih û her muxalefeyek wê xwediyê wê rastî berpirsyariya qanûnî were.



# Li Libyayê 129 çeteyên sûrî hatin kuştin û dewleta Tirk hê jî dişîne

Di encama şerê li paytexta Lîbyayê de 129 çeteyên Sûrî yên ku dewleta Tirk şandine, hatin kuştin û di heman demê de dewleta Tirk hê jî proseya şandina bi darê zorê li hundirê Tirkiyê dide meşandin.
Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyê (SOHR) diyar kir ku di encama operasyona leşkerî ya li Lîbyayê de jimara çeteyên Sûrî yên ku hatine kuştin, bû 129.
SOHR`ê piştrast kir ku çeteyên hatîn kuştin ên Lîwa El-Mutesim, Firqet Sultan Murad, Seqir El-Şemal, Hemzat û Silêman Şah in û di encama operasyonên li eniyên Hey taxa Selah El-Dîn a başûrê Terablusê, eniya Remla a nêzî balafirgeha Terablusê û eniya Meşrû Hedebê, her wiha şerê Misrata û herêmên din ên li Lîbyayê de hatine kuştin.

**MEAŞÊN ÇETEYAN KÊM KIRIN**

Di heman çarçoveyê de SOHR’ê ragihand ku jimara kesên tev li artêşê bûne, li gorî jimara Tirkiyê diyar kiriye ku ji 6 hezar çete zêdetir bûye. Ji ber wê meaşên çeteyên sûrî yên ku şandine şerê li Lîbyayê kêm kirine.
Di demên derbasbûyî de Jimara çeteyên ku gihaştine paytexta Lîbyayê Terablusê heta niha gihşştiye 4 hezar û 750î, di heman demê de jimara çeteyên li Tirkiyê tev li perwerdeyê dibin jî gihîştiye hezar û 900î.



# Li Efrînê 7 çete hatin kuştin



Hêzên Rizgariya Efrînê (HRE) bi daxuyaniyekê ragihand ku li Efrînê 7 çeteyên artêşa Tirk hatin kuştin û 19 çete jî birîndar bûn. Herwiha erebeyeke çeteyan jî hat roxandin.
HRE’yê di daxuyaniya xwe de ragihand ku topbarana artêşa Tirk a dagîrker û çeteyên wê ya li dijî herêmên Efrîn û Şehbayê bê navber dewam dike.
Di daxuyaniya HRE’yê de wiha hat gotin:
“16’ê Adarê hêzên me li Efrînê li hemberî bendeke kontrolê ya çeteyan çalakiyeke sabotajê kirin. Di çalakiyê de 4 çete birîndar bûn.
18’ê Adarê hêzên me li navenda bajarê Efrînê rêzeçalakiyên sabotajê kirin. Di çalakiyan de 6 çete hatin kuştin, 15 çete jî birîndar bûn.
Li gundê Celemê ya navçeya Cindirêsê hêzên me li dijî çeteyên dagîrker çalakiyek kirin. Di çalakiyê de çeteyek hat kuştin û wesaitek hat roxandin.
Bi giştî di çalakiyên 2 rojan de 7 çete hatin kuştin, 19 çete jî birîndar bûn.”

# Herî kêm 24 çekdarên Efxanistanê di êrîşekê de hatin kuştin



Li başûrê Efxanistanê di êrîşekê de ku tê texmîna rêxistina Taliban kiribe, 24 çekdarên Efxanistanê hatin kuştin.

Rayedarên Efgxnistanê ji AFP’ê re ragihandin ku herî kêm 24 endamên ewleyiya Efxanistanê îro di êrîşa li dijî baregehên wan yên li başûrê welat de hatin kuştin.
Berdevkê hikumetê Hakim Zabil Rihmellah Yarmil wiha got: “Saet 3’yê sibehê bi dema Greenwichê 24 endamên hêzên polîs û ewleyiya Efxanistanê di encama êrîşa kesên nenas de şehîd bûn.”
Serokê bajarê Zabil Eta Canheq piştrast kir ku ev êrîş girêdana wê bi Tevgera Talîban re heye.

# Li Efrîka û Asya 3 milyar kes bêparast in: Av nîne, sabûn nîne!

Li welatên xizan 3 milyar mirovên ku her sal dikevin nava lepên gelek nexweşiyan, niha jî li hemberî vîrûsa koronayê bêparast in. Pisporên Neteweyên Yekbûyî hişyarî da.

Vîrûsa korona ya nû Covîd-19 ku li Çînê dest pê kir û navenda wê êdî welatên Ewropa ye, bi taybetî gefê li welatên xizan dixwe.
Li gelek welatên xizan hê kesên bi nexweşiyê ketîn û bûyîn qurban kêm in. Lêbelê 3 milyar mirovên li wan welatan ji ava paqij û pêwîstiyên paqijiyê bêpar in.
Ew welatên xizan jî bi giranî li Efrîka û Asyayê ne.
Li gorî texmînên Fona Alîkariya Zarokan ya Neteweyên Yekbûyî (UNICEF) li seranserê dinyayê 3 milyar mirov derfetên wan nînin ku rojane destê xwe bişûn. Ev rewş jî tê wateya ku ji sedî 40 yê nifûsa tevayiya cîhanê.
Li gorî berpirsyarê UNICEF’ê yê Başûr û Rojhilatê Efrîkayê Sam Godgrey, li gelek welatan ava nagihêje malan, her wiha beşeke girîng a nifûsê jî ewqasî xizane ku nikare sabûnê bikire.
Li gorî UNICEF’ê li Efrîka ya Jêrî Sahrayê ji sedî 63 yê nifûsê (258 milyon kes) derfetên xwe yên peydakirina ava paqij, sabûn û pêwîstiyên din ên paqijiyê nînin. Ji sedî 22 yê nifûsa herêmên navî û başûr ên Efrîkayê (153 milyon) kes ji van derfetan bêpar in.





# Li ser qurbanên Helebce û Efrînê li Kerkûkê pêşangehek hat vekirin

Jinên Ciwan ên Têkoşer, bi pêmana bîranîna salvegera komkujiya Helebce û dagçrkirina Efrînê, li Bazara Şorçe ya Kerkûkê pêşangeheke wêneyan vekirin.

Li Kerkûkê ji bo bîranîna qurbanên komkujiya Helebce û dagîrkirina Efrînê, li Bazara Şorçe ya Kerkûkê ji aliyê Jinên Ciwan ên Têkoşer ve pêşangeheke wêneyan hat vekirin.
Ji jinên ciwan Sumeyye Ehmed li ser mijarê axivî diyar kir ku wê li hemberî her rengê komkujî û dagîrkeriyê bêdeng têkoşînê bikin û wê bêdeng nemînin.
Welatiyan eleqeyek zêde nîşanî pêşangehê da.



# Pirtûkfiroşan jî nesîbê xwe ji koronayê girt: Xwendevan newêrin dest bidin pirtûkan

Li seranserê cîhanê heta niha ser heşt hezarî re mirov ji ber vîrûsa koronayê mrine. Piştî vîrûs belav bû, li gelek welatan deverên qelebalix tên girtin û pirsporên tenduristiyê jî dibêjin bila ti kes ji malê dernekeve. Ji ber wê li gelek bajaran welatî ji malê dernakevin. Li Amedê pirtûkfiroşin vekirî ne, lê gotin ji ber vê rewşê mirov nayên û newêrin dest bidin pirtûkan.

Ji xebatkara Mala Pirtûkan a Lîlavê Rabîa Karayilê diyar kir ku daxwaziya ji bo pirtûkan pir kêm e û got, ya rast bandora vîrusê jî heye. Çimkî gava mirov dernekevin derve, ev tê wateya ku jiyan bi awayekî tê rawestandin. Û gava em li firotina rojane ya pirtûkan jî mêze dikin em dibînin ku kêm bûye. Lê belê hin xwendevan jî hene ku dixwazin vî wextê xwe baş derbas bikin.

**‘PIRTÛK ÇAVKANIYA MORALÊ NE’**

Karayil, diyar kir ku di nexweşiyan de, di şer de, di rewşên neyînî de bandoreke erênî ya xwendina pirtûkan heye û got, xwendina pirtûkan çavkaniya motîvasyonê ye. Helbet ji bo tenduristiyê derneketina mirovan ya derve jî tiştekî asayî ye. Kêmbûna çûnhatinê hem ji bo tenduristiya me hem ji bo ya xwendevanan rewşeke baş e.



**‘ME DIGOT WÊ ZÊDE BIBE LÊ NEBÛ’**

Xwediyê pirtukakurdi.com’ê bawer Berşev jî diyar kir ku li bendê bûn ku firotina pirtûkan zêde bibe, lê ji sedî 10 kêm bûye û got, me digot gava mirov li malê bin dibe ku pirtir pirtûkan bixwînin. Lê ji ber vê nexweşiyê rojeva mirovan naguhere.”

# Bi dîrok û mîtan Newroz



**BARIŞ BALSEÇER**

Newroz ji bo mirovan, xasma ji bo Kurdan nîşana girîngiya dewra salê ye. Dawîhatina li zivistanê ye ku bi rengekî temsîla mirinê ye û destpêka biharê ye ku bi rengekî destpêka jiyanê ye û bûye sedema gelek rîtuel, ayîn, efsane û rêûresmên cihê. Bi arkeolog Mesût Alp re em li ser nîşanên Newrozê, dîroka wê û veguhestina wê peyivîn. Ew dibêje, belgeyên pêşî ên elaqedarî Newrozê yan jî dawiya zivistanê û destpêka biharê wek cejin ji Sumeran mane. Ev jî cejna Akîtu ye ku li ser konseptên mîtolojîk ava bûye. Di mîtolojiyê de xwedawend Dimuzî çûye binê erdê û xwedawend Înanna ya ku paşê wê di mîtolojiyê de nav û dirûvên Îstar, Afrodît û Artemîs jî bigire, diçe wî rizgar dike. Helbet ew li vir behsa qeydên nivîskî dike. Lê ew cejnê serê Nîsanê pîroz dikin çawa ku îro li nava Êzîdiyan jî sersal 14´ê Nîsanê ye. Axir Mesût Alp dibêje, gava mirov teqwîma Sumeran biqulibîne teqwîma mîladî ya îro, hingê ew rastî 21´ê Adarê tê. Suryanî û Asûriyên li Kurdistanê vê cejna ji Sumeran mayî îro jî bi heman navî pîroz dikin.
Li gorî Mesût Alp, hesin û hesinkar jî ne tesaduf in, hesin di jiyana me de gelek girîng e. Wekî din jî bi ya wî, “hatina hêsin di heman demê de şoreşa wê heyamê ye. Ji ber wê jî lazim e qehremanê me hostekarekî hesinkar be, divê ew xwedî argumanekê be ku bikare dîrokê biguherîne. Ji ber wê jî ne tesaduf e ku di mîtolojiya me de Kawayê Hesinkar hebe.”

Li gorî Mesût Alp, hesin û hesinkar jî ne tesaduf in, bi ya wî, “hatina hêsin di heman demê de şoreşa wê heyamê ye. Ji ber wê jî lazim e qehremanê me hostekarekî hesinkar be, divê ew xwedî argumanekê be ku bikare dîrokê biguherîne.”

# Tirsa Mirinê



Sîpan Şînda

Mirin, bi dawîbûna jîna mirovan, ango zindiyan tevan e. Mirin, riya ber bi nediyariyê ve ye. Mirin, destqetîna ji heskiriyan e. Mirin, terkkirina bîranîn, evîn, kêliyên mestê, destjêberdana yar û ezîzan, xatirxwestina ji dost û hevalan e. Mirin, bêbextiya li dilsoziyan e. Mirin, rastiya tehl e! Her çend mirov ne xerîbê mirinê bin jî, lêbelê ewqas xwe dûrî wê dibînin ku, tu dibêjî qey ti caran nedîtiye, nebihîstiye ti kes mirî. Her çend mirov dizanin ku wê bimirin jî, lê tirsa mirinê ew êxistine di rewşeke welê de ku ew tirs ji mirinê bixwe xirabtir e. Kesên ku tirsa mirinê ket dilê wan, êdî zûbizû bi ser xwe ve nayên. Derûniya wan têk diçe. Ew her tim di nava dîwarên teng de ne. Ew tişta ji mirinê mestir dibînin. Erê, tirsa mirinê ji mirinê mezintir e! Mirin bixwe bi deng e. Lê belê tirsa mirinê bêdeng e. Ew bêdengiya tirsa mirinê ya dikeve hinavê mirovan, weke kurmek bikeve nava rayên darekê û wan rayên ku ew dar pê dijî û xwe li ser piyan digire yek bi yek diqusîne, ew bêdengî jî wisa li mirovên ku tirsa mirinê dikeve dilê wan de dike. Gelo ev tişteke çawa ye? Tirsa mirinê rayên dilê mirovî diqusîne. Êdî nahêle ew ser xwe ve bê. Roj bi roj rayên wan yên jiyanê ziwa dike, gulên baxên jiyana wan diçilmisîne. Wan bê hêvî dike. Jiyanê li ber çavên wan reş dike. Dema jiyan li ber çavên mirovî reş dibe, êdî rayên mirovî yên jiyanê ji qut dibin. Mirov çi tamê ji jiyanê she nake. Her tim tiştek di bîra wan kesên ku tirsa mirinê ketiye di dilê wan de heye; ezê kengê û çawa bimirim? Êdî heta ku mirin bê û patika wan re bigire, ew bi vê pirsê û bi vê tirsê dijîn. Ezê bimirim! Êdî ji bo wan kesan ev ji rastiyê boriye. Bûye iletek, êşek, janek û ketiye nava hinavê wan. Ew êşa ku tirsa mirinê dide wan, ji ya nexweşiyan tevan mezintir e. Ev di jiyana mirovan de dibe weke pêvajoyekê û dikeve giyanê mirovan. Heta mirinê didome. Hizra mirinê, ezê çawa bimirim, li ber mirinê re ezê çi êşê bikişînim û wê çi bê serê min? Ev tirs mirovan ji xewê dike, ji têkiliyan dike, derûniya wan serûbin dike. Ev ne tenê tirsa ji heskiriyên xwe dûrketinê ye. Ev tirsa tinê mayînê ye, ya tinebûnê ye. Tirsa derheqê piştî mirinê de ti tiştî nezanînê ye
Tu ji kê pirs bikî wê bêjin tirsa mirinê bi min re nîne. Dema hinek bêjin tirsa mirinê bi min re heye jî, dibêjin tu nexweş î, here cem psîkolog. Lê di rastiyê de pirê mirovan navên ku tirsa mirinê ya di dilê xwe de vebêjin. Heta ew bixwe ji naxwazin vê qebûl bikin. Ew kesên tirsa mirinê dikeve zikê wan, pirtir bi heskiriyên xwe ve tên girêdan. Kesên ku oldar bin, oldariya wan zêde dibe. Kesên ku bêbawerî bin jî hişktir dibin. Ew tirsa ku wê laşê wan tine bibe, wê çi ji heskiriyên wan bê, wê kengê bimirin, piştî mirinê wê çi bê serê wan? Ev hemû serê wan tevilhev dike û tirsa wan zêdetir dike. Mirin çiqasî ji mirov dûr be, divê mirov tirsa wê jî hê ji xwe dûrtir bike. Va ye îro ji ber covid 19 tirseke mezin ya mirinê ketiye dilê cîhanê tevê. Hêvîdar im gelê me û mirovayî berî gavekê ji vê nexweşiyê xelas bibe.

# ‘Her birîndarê ku min derman dikir, kurê min Menan bû’

Serhatî û çîrokên lehengiyê, 58 rojên berxwedanê yên li hemberî dewleteke ku endama NATO‘yê ye û doza girêdana bi welêt êdî bûye beşek ji jiyana şêniyên Efrînê yên ku neçar mane koçber bibin. Ji wan çîrokan yek jî ya Dunya Elûş e.

Di êrîşên artêşa Tirk a dagîrker yên ser kantona Efrînê ku 20`ê Çileya 2018`an dest pê kir de her kesî berdêla girêdana bi axa xwe ve da.
Di dirêjahiya 58 rojên qonaxa yekemîn a Berxwedana Serdemê de bi sedan çîrok û serpêhatiyên girêdayî gelê ku xwest bi azadî û demokratîk bijî, derketin pêş. Fedekariyên jinan di vî warî de nayên veşartin. Jinan roleke pêşeng di Berxwedana Serdemê de lîst.
Dunya Elûş (42) ji gundê Kûra yê navçeya Cindirêsê ya bakurê rojavayê bajarê Efrînê ye. Dunya dayika sê zarokan e; Menan, Hisên û Mihemed Hiso.
Dunya li gorî kevneşopên civakê yên berê di 17 saliya xwe de dizewice. Pişt 10 salan ango berî 15 salan hemserê wê Ehmed Hiso dimire. Dunya tevî her sê kurên xwe li mala bavê xwe ya li gundê Kûra dimîne û di nava zeviyan de kar dike.
Dunya kurên xwe li ser heskirina welêt mezin dike. Piştî salekê ji destpêkirina Şoreşa Rojava di 19`ê Tîrmeha 2012`an de kurekî wê tevlî refên şoreşê dibe.
Ji ber heskirina welêt û naskirina tevgerên Kurd Dunya tevî nexweşiya xwe di 2017`an de cihê xwe di nava refên Hêzên Parastina Civakî-Jin de digire.

### DEMA BIRÎNDARAN DERMAN DIKE AGAHIYA ŞEHADETA KURÊ XWE DIBIHÎZE

Dunya dema alîkariya birîndaran û hemşîreyan dike, agahiya şehadeta kurê xwe dibihîze. Dunya wiha dibêje: “Dema min birîndar derman dikirin min his dikir ku her birîndarek kurê min Menan e.
Piştî berxwedana 58 rojan şêniyên Efrînê neçar man ji Efrînê ber bi kantona Şehbayê ve koçber bibin. Herwiha artêşa Tirk piştî dagîrkirina Efrînê şêniyên bajêr ên resen dan koçberkirin.
Dunya wiha dibêje: “Em neçar



man ji bajarê xwe koçber bibin. Di rêwîtiya koçberiyê de xwîşka hemserê min ji ber dengê balafirên wefat kir. Balafiran sivîlên ji bajêr derdiketin kirin hedef. Ji ber wê min li çarxeriya Maratê li Efrînê ew binax kir. Piştre me riya xwe ber bi Şehbayê ve domand.”
Niha Dunya tevî malbata birayê xwe li gundê Babnisê yê kantona Şehbayê dimîne.

## Projeya Dîcle; li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji projeyeke destpêkê ber bi projeyeke nimûne ve

Projeya Dîcle ya xwedîkirina çêlekan li gundê Zixat ê girêdayî navçeya Dêrikê, li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê projeyeke tekane ye û beşeke pêwîstiya herêmê ji şîr, mast û penîr peyda dike.

Projeya Dîcle ya xwedîkirina çêlekan ji hêla Saziya Çandinî û Xwedîkirina Sewalan ve ya girêdayî Navenda Geşepêdana Aborî ya Dêrikê ve hat amadekirin. Destpêkê projeyeke piçûk a xwedîkirina çêlekan bû. Lê piştre fireh bû û êdî li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûye projeyeke nimûne.
Di projeyê de 6 axurên taybet ên çêlekên berhemdar û golikan hene.
Di Projeya Dîcle de li derdora 500 serî çêlek hene. Piştî firehkirina projeyê, 400 serî pez jî lê hatin zêdekirin.
Projeyê derferên kar ji gelek



malbatan re peyda kirin. Di vê dawiyê de derfetên kar ji bo koçberên ku neçar mane ji warên xwe koçber bibin, peyda kir. Piraniya wan ji herêmên Serêkaniyê ne. Di projeyê de 12 malbat kar dikin.
Projeya Dîcle rojane derdora tonek û nîv şîr hildiberîne. Ew hilberîn ji sûkan re tê şandin. Tevî wê jî beşek ji bo çêkirina mast û penîr tê veqetandin.
Berpirsê projeyê Ciwan Sîd derbarê mijarê de got, “Li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê ev projeya ya yekemîn e. Tevahiya pêdiviyên wê bi keda karker û berpirsên wê tên peydakirin.”

## Komîteya Çandiniyê semad li cotkaran belav kir

Komîteya Çandiniyê ya Kantona Şehbayê bi armanca alîkariya cotkaran û rêgirtina li ber keysbaziya li bazaran, dest bi belavkirina semada kîmyewî kir.

Komîteya Çandiniyê 3 hezar û 500 kîs semada Yorya li 46 cotkarên kantona Şehbayê belav kirin. Ev cure semad ji bo hilberînên genim û ce bi awayekî taybet tê bikaranîn. Komîte bi vê gavê dixwaze alîkariya cotkaran bike da ku hilberîneke bi kalîteyeke baş bi dest bixin.
Komîteya Çandiniyê ji bo her hektarek zeviyên bejî 100 kg û ji bo zeviyên avî jî 250 kg ji vê cureyê semad diyar kir.
Komîteyê heta niha 3 hezar û 500 kîs semad li cotkaran belav kirine.
Komîteya Çandiniyê bihayê her kîsê semadê ku ji 50 kg pêk tê, bi 24 hezar û 500 lîreyên Sûriyê diyar kir. Kîsê semadê bi heman pîvanê di nava sûkan de bi 27 hezar lîreyên Sûriyê tê firotin.
Girêdayî mekanîzmaya belavkirinê, destpêkê cotkar bi riya komîna gund daxwaznameyekê dişînin Komîteya Çandiniyê ya herêmê. Piştre semad li gorî miqdarên berê hatiye diyarkirin, li cotkaran tê belavkirin.



## Li Tirbespiyê çandiniya sebzeyan îsal gelek pêş ketiye û pêdivî bi piştgiriyê heye

Îsal li Tirbespiyê çandinî bi awayekî berbiçav pêş ket, nemaze sebze. Cotkar bang dikin ku pirtir piştigirî ji wan re bê pêşkêşkirin da rêgeza xwetêrkirinê pêk bînin û rê li pêşiya keysbaziya bazirganan bigirin.

Çandinî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê çavkaniyeke sereke ya aboriya herêmê ye. Digel dorpêç, aloziya Sûriyê û daketina nirxê lîreyê Sûriyê li hemberî diravên din. Ji ber wê pêkanîna rêgeza xwetêrkirinê bûye pêwîstiyek. Gelek projeyên mezin û piçûk li navçeya Tirbesiyê di salên dawî de hatin meşandin. Ji ber wê qada çandiniyê, bi taybetî çandina sebzeyan bi awayekî balkêş pêş ket. Îsal rûberên zeviyên ku bi sebzeyan hatine çandin fireh bûn. Li gorî herêmên din ên herêma Cizîrê navçe gihîştiye asta rêgeza xwetêrkirinê.

### HILBERÎNA HERÊMÎ

Digel vê pêşketinê û keda tê dayîn, encama wê li ser bihayan ne li gorî ku dihat xwestin bû. Bihayê sebzeyan hê bilind e. Cotkar dibêjin em tov û semadê bi dolar dikirin. Li rex wê jî bazirgan keysbaziyê dikin û bihayê berhemên herêmî giran dikin bê ku kesek wan muhasebe bike. Her wiha li navçeyên mîna navçeya Tirbespiyê tevî hilberîna zêde ya sebzeyan, sûkeke navendî ya taybet nîne. Berhem li sûka Qamişlo tên firotin. Piştre xwediyên dikanên navçeya Tirbespiyê sebzeyan ji wan dikirin û li navçeyê difiroşin.





# Armanca koperatîfên jinan berfirehkirina rêgezên kolektîv e

Li navçeya Tirbesiyê ya kantona Qamişlo bi armanca piştgiriya aboriya civakî û belavkirina rêgeza kolektîv di kar de, gelek koperatîfên jinan hatin avakirin.



Armanca Komîteya Aborî ya Jinan a navçeya Tirbespiyê piştgiriya aboriya civakî, pêşxistina aboriya jinan, herwiha peydakirina pêwîstiyên welatiyan bi nirxên guncaw e.
Li kantona Cizîrê koperatîfên taybet ji bo jinan zêde bûne, yên girêdayî çandiniyê gihîştin 16an.
Li navçeya Tirbespiyê ya kantona Qamişlo piştî serkeftina koperatîfa baxçeyên sergirtî ku Komîteya Aborî ya Jinan destpêka sala 2017‘an dest pê kiribû ku gelek cûreyên zebzeyên havînî peyda kirin û 41 ton derbasî bazarên xwecihî kirin, koperatîf zêde bûn.
Koperatîfa Simbilên Rojava, ev koperatîf îsal bi beşdariya 10 jinên ji navçeya Tirbespiyê hatiye avakirin. Di vê çarçoveyê de gelek cûreyên zebzeyên zivistanî hatin çandin. Di baxçeyên sergirtî de şitlên hin zebzeyên havînî hatin danîn da derbasî bazarên xwecihî bikin. Komîteyê ji bo vê projeyê 500 donim erdê li rojhilatê navçeyê veqetand.
Bi armanca berfirehkirina koperatîfên çandiniyê yên taybet ji bo jinan komîteyê koperatîfek bi navê “Rojava” ava kir. Ji bo vê koperatîfê hezar donim erd hat veqetandin da zebzeyên havînî wekî xiyar, bacan, pîvaz û hin cûreyên din werin çandin.

## Agirê em pê bixin wê ruhê Newrozê zindî bihêle!




PAJK: Agirên ku em li ser banan û kolanên xwe pê bixin, wê ruhê Newrozê zindî bihêle. Divê gelê me di warê tendirustiyê de xwe biparêze û teqez agirekî Newrozê pê bixe.

PAJKê bi daxuyaniyekê cejna Newrozê pîroz kir û ev nirxandin kir: ‘”Cejna Newrozê ya ku gelên Rojhilata Navî dikevin roj û saleke nû, li pêş me ye. Gelên li herêmê bi coş û heyecaneke mezin Newrozê pîroz dikin û ji bo Kurdan jî cejna netewebûnê ye. Ev rastî bi meşa hebûn û azadiya ku Rêbertiya me daye destpêkirin, wateyeke xurt wergirtiye. Li bal Kurdan Newroz tê wateya berxwedan, hebûn û azadiyê. Di serî de berxwedêrê mezin Rêber Apo, em di şexsê Mazlûm Doganê Kawayê Hesinkar ê hemdem, Zekiye, Ronahî, Bêrîvan û Ûgûr Şakar de, Cejna Newrozê ya şehîdên xwe, gelê xwe û rêhevalên xwe yên ku li her dera dinyayê li ber xwe didin, pîroz dikin.”
Di dewama daxuyaniyê de wiha hat gotin:
Her Newroz ji bo gelên Kurdistanê dibe destpêkeke nû. Kurd bi têkoşîna li dijî Dehakê zalim pêşiya tevayiya etnîsîteyan vekiriye û li dijî Dehakên hemdem têkoşîna xwe didomîne. Ji DAIŞ’ê heta faşîzma AKP û MHP’ê li dijî tevayiya hêzên faşîst têkoşîna xwe didomîne û pergala xwe ya azadiyê jî ava dikin.



## Agirê Newrozê nayê vemirandin

Jinên Girê Spî yên ku koçberî Kantona Kobanê bûyîn, derbarê Newrozê de hestên xwe anîn ziman û gotin: “Her sal bi dilekî germ me Newroza xwe pîroz dikir û têkoşîna xwe di Newrozê de dida diyarkirin. Îsal jî tevî êrîş, koçberî û qedexekirinê, emê li ber deriyên mala xwe agirê Newrozê geş bikin.”

Dayîka bi navê Emîna Mustefa diyar kir ku her sal berî 21’ê Adarê cejna Newrozê amadekariya xwe dikirin û got: “Me bi şev agirê Newrozê geş dikir, bi roj jî, me cil û bergên Kurdî li xwe dikirin û Newroz pîroz dikir. Bi salan e em cejna Newrozê pîroz dikin, lê îsal ji ber belavbûna vîrûsa korona em nikarin weke her sa pîroz bikin. Dîsa jî emê li ber deriyê mala xwe agirê Newrozê geş bikin, ji bo ku ew ruh bi me re zindî bimîne.”

Jina bi navê Leyla Xalid jî hestên xwe wiha anîn ziman: “Her sal 21’ê Adarê me li bajarê xwe pîroz dikir, lê îsal em koçber in û Newroz cudahiyeke xwe heye. Piştî belavbûna vîrûsa Korona, şahiya Newrozê weke her sal nayê lidarxistin. Dewleta Tirk û hevkarên wê ji bo tinekirina me êrîşî me kirin û em ji ser axa me koçber bûn. Tevî êrîş û koçberiyê jî emê dîsa agirê Newrozê li ber deriyê mala xwe geş bikin û Newroz 2020’an bi ruhekî germ pîroz bikin.”

Ciwana bi navê Necmê Mihemed jî Newroza 2020’an li gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê pîroz kir û got, “çawa Kawayê Hesinkar şeva Newrozê agir geş kir, têkoşîn kir û roja nû hilat, emê jî bi wî ruhî têkoşîn bikin û li hember dijmin bi ser bikevin. Tevî ku em koçber bûne emê Newoza xwe pîroz bikin.”

Zaroka bi navê Emîna Xalid jî got em her sal vê rojê bi geşkirina agir û gerandina govendê pîroz dikin. Newroz li gelê Kurd pîroz be.”

## Adar ji bo gelê Kurd hem şahî ye hem şîn e

*Ronîda Hacî- Sorgul Şêxo*

Jina bi navê Fatma Fatê (61) her sal amadekariya 21’ê Adarê dike. Hem bi dilekî şad hem xemgîn diyar dike ku Newroz ji bo wê xwedî taybetmediyek mezin e û wiha dewam dike: ”Meha Adarê hem şahî hem jî xemgîniya me derdikevin pêş. Herwiha mehên biharê jin xwedî semboleke girîng in. Jin û bihar yek in. Lewre jin bi xwezayê ve girêdayî ye, bi hatina biharê şa dibe.”



### ‘Her amûr dîrokeke veşartî ye’

Fatmayê da zanîn ku her salê bi hatina biharê pêdiviyên dîrokî derdixe û mala xwe pê dixemilîne û wiha axivî: “Ez bi hatina biharê şa dibim. Îro min tiştên xwe yên dîrokî derxistine da mala xwe bi wan bixemlînim û pêşwaziya Newrozê bikim. Cil û bergên kurdî, kameraya min ku min bi wê rojên xweş û dîrokî kişandine. Weke din tiştên dîrokî yên weke cezwe û fanûsê. Her amûr dîrokek e. Heta sax bim ezê parastina wan bikim û biherê derxim.

### ‘Agirê Kawayê Hesinkar li hemberî desthiltdarî û zilmê pê xistî ti carî venamire’

Fatmayê di dewama axftina xwe de behsa Newrozê û kameraya xwe kir û wiha got: “Salên borî em bi hevalên xwe re derdiketin Newrozê, me cil û bergên kurdî ji xwe re çêdikirin da ku em derkevin Newroza xwe pîroz bikin. Wan salan Newroz ji bo Gelê Kurd qedexe bû. Lê digel wê em derdiketin newrozê. Em rastî işkenceyan dihatin. Lê em bi israr bûn û heya roja îro em bi israr in.

### ‘Şoreşa Rojava ji bo Kurda şansek e’

Fatmayê Şoreşa Rojava bi şansekî xweş ji bo gele kurd pênase kir û wiha got: “Ji bo me axaftina bi zimanê me, lixwekirina cil û bergên kurdî û pîrozbahiya Newrozê qedexe bû, lê îro di Şoreşa Rojavayê Kurdistanê de êdî ciwan û jinên me serbest in. Ji bo wê parastina ziman, xak û hebûna me erkê her kesî ye. Şoreşa Rojava roja me ronî kir.

# Şêxê êla El-Cewale: Perspektîfên Ocalan kilîta çareseriya aloziyan in

Şêxê êla El- Cewale Ebdurrehman El-Reşîd got, "Rêber Abdullah Ocalan xwedî nêrîn û fikrên ji tevahiya gelên herêmê re guncew in. Em bang li êl û eşîrên Ereb dikin ku roleke çlaktir bilîzin ji bo aloziyên herêmê çareser bikin û li hember dagirkeriyê li ber xwe bidin."

Şêxê êla El- Cewale Ebdulrehman El-Reşîd ê li herêma Cizîrê diyar kir ku dewleta Tirk bi zanabûn, agir bi daristana girava Îmraliyê xist û got, "Armanc ew e ku vîna gelên herêmê yên ku xwedî li fikr û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan derketine, bişkîne. Ji ber daxwazkyên gelêrî li hundir û derve dewleta Tirk neçar ma rê bide hevdîtinê bi Rêber Abdullah Ocalan re."

El-Reşîd da zanîn ku nêrîn û perspektîvên Rêber Abdullah Ocalan kilîta çareseriya aloziya herêmê ne.

El-Reşîd îşaret pê kir ku Rêber Abdullah Ocalan gelên herêmê baş nas dike û wiha axivî: "Rêber Ocalan dizane ku pergalên serdest ên ku li ser bingeha çewisandina gelan ava bûne li ser desthilatên xwe ditirsin. Ji ber wê Tirkiye tecrîdek giran li ser Rêber Abdullah Ocalan dimeşîne. "

**'JI ÊLÊN EREB TÊ XWESTIN KU ROLEKE DÎROKÎ BILÎZIN'**

Di berdewama gotinên xwe de El-Reşîd rola ku êlên Ereb ji berê ve ji bo parastina welat û gel de dilîstin bibîr xist û got, "Îro ji her demê pitir jê tê xwestin, roleke dîrokî bilîze û vê pêvajoyê ber bi çareseriyek aştiyane ve birêve bibe, bi şêwazekê ku xizmeta gelên herêmê dike û li hemberê dagirkeriya derve tê sekinandin."



El-Reşîd di dawiyê de bang li êl û qebîleyên Ereb kir ku rolek girîng ji bo berjewendiya Sûriyê bilîzin û got, "Ax û gelê wê biparêzin û yekitiya netewî di navbera pêkhateyên herêmê de ji Kurd, Ereb û Suryan bidin rûniştandin."

## 'Çareserî Sîstema Neteweya Demokratîk e'



Siyasetmedar Mihemed Hisên got; "Fikrê Rêber Abdullah Ocalan ê projeya neteweya demokratîk riya tekane ya çareserkirina aloziya Sûriyê ye û divê li Rojhilata Navî pêk were."

Dewlweta Tirk bi tecîrda giran ya li ser Rêber Abdullah Ocalan pîvanên exlaqî û qanûnên navdewletî tevan binpê dike. Digel tecrîd û îzolasyona li ser Rêber Apo, fikrê wî her ku diçe ji aliyê gelan ve pirtir tê pejirandin.

Bi taybetî bi Şoreşa Rojava re bi awayekî eşkere diyar bû ku riya çareskirina kaosa sîstema kapîtalîst û dewlet-netewe tê de enceq bir rêbaza sîstema neteweya demokratîk were çareserkirin. Ji ber wê her ku hat fêmkirin ev sîstem ji aliyê gelan ve pirtir hat pejirandin.

Derbarê nêrînên Rêber Abdullah Ocalan û girîngiya wê di çareserkirina aloziya Sûriyê û krîzên Rojhilata Navî de, berpirsê Bûroya Partiya Kesek a Kurdistanê ya navçeya Dirbêsiyê Mihemed Hisên ji ANHA'yê re axivî û got divê her kes li sîstema Rêber Abdullah Ocalan pêş xistî xwedî derkeve.

Mihemed Hisên diyar kir ku gelên Rojhilata Navî di nava nakokî û krîzên siyasî de de dijîn, esasê van krîzan pergelên hakim û dewletên netewperest in.

Hisên wiha got: "Gelên herêmê têgihiştin ku ev pergal nikarin demokrasî û jiyana hevbeş pêk bînin. Lewre destpêka hatine avakirin ti xizmete pêşkêşî gel nekirine. Piştî karesat û aloziyên pergelên netewperest afirandine projeya neteweya demokratîk hêviya tekane ya çareserkirina nakokiyên li herêmê dimîne. Em dibînin ka çawa Rêveberiya Xweser hişt ku gelên herêmê bi hev re bijîn û di eniyekê de xaka xwe biparêzin."

Hisên da xuyakirin ku projeya neteweya demokratîk ya Rêber Abdullah Ocalan pêşkêş kirî riya tekane ya çareserkirina aloziya Sûriyê ye û sîwana jiyana hevbeş ya gelan tevan e.

Berpirsê Buroya Partiya Kesk a Kurdistanê ya navçeya Dirbêsiyê Mihemed Hisên di dawiya axaftina xwe de got, divê projeya neteweya demokartîk a li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatî rûniştandin li seranserê Sûriyê û Rojhilata Navî pêk were.

## Tirkiye... Kurd di navbera krîza Koronayê û siyaseta hikumetê de

Bi belavbûna vîrûsa Koronayê re, bi milyonan Kurd û hin gelên din li Tirkiyê di nava metirsiyê de ne. Nexazim gelek ji wan bi zimanê tirkî nizanin.


Partiya Gelan a Demokratîk (HDP) bang li hikumeta Tirk û Wezareta Tenduristiyê ya Tirkiyê kir ku hişyarî û agahiyên têkildarî vîrûsa Koronayê bi zimanên din jî belav bikin ku yek ji wan jî zimanê kurdî ye.

Hevserokê şaxê bajarê Amedê yê HDP'ê Zeyyat Ceylan, dubare bang li saziyên tenduristiyê yên li Tirkiyê kir ku zimanê kurdî jî bi kar bînin. Herwiha bang li saziyên tenduristiyê kir ku bi riya dezgehên çapemeniyê yên herêm û malperan agahiyên nû yên têkildarî vîrûsa Koronayê belav bikin.

Ziyat bi riya Tora Erebiye Net diyar kir ku Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) bi zimanê kurdî gelek hûrgilî û dîmenên têkildarî awayên parastina ji vîrûsa Koronayê belav kirin. Lê saziyên tenduristiyê û desteyên li Tirkiyê bi carekê zimanê kurdî bi kar naynin û gelek kesên ku li vir dijîn bi zimanê tirkî nizanin.



Zeyyat Ceylan di dawiya axaftina xwe de got gelê Kurd kanala TRT Kurdî naşopîne, lewre Kurdan bi terorîstî bi nav dike.



### DUH HATAY ÎRO İDLİB, EFRİN, CERABLUS...

Qasim ENGÎN

Li ser dagîkeriya axa Sûriyê ya ji aliyê dewleta tirk a faşîst ku şefê wê Tayyip Erdogan e nîqaşên wê ji ser vê axê derkeve an jî bimîne, berdewam dikin.

Bila were bîra me: Sûriye ya ku di bin mêtîngeriya Fransa de bû di 27'ê Çileya 1937'an de li Cinêvê Cemiyeta Neteweyan civîn pêk hat û serbûxwebûna Hatay hat îlankirin û biryar hat girtin ku bi hilbijartinekê piraniya nifûsê bê diyarkirin. Fransa ji bo Tirkiye piştgiriyê nede Hîtler a Almanyayê hevpeymanek çêkir. Li ser biryara çêkirina hilbijartinê dewleta Rirk li Hatayê ku piranî ji Ereban pêk dihat hejmarek zêde, derxistin demografiya wê hat guhertin û di 2'ê Îlona 1938'an de Komara Hatay hat avakirin. Ev meclîs a ku piraniya wan ji leşker û bûrokrasiyên dewleta Tirk pêk dihat qaşo bi hilbijartineke wek refandûmê di 29'ê Hezîrana 1939'an de wek wîlayet tevlî Tirkiyê hat kirin.

Dewleta Tirk a dagîrker di sala 1974'an de bi heman şêwazî ket Bakûrê Qibrisê jî. Bi salan nîqaşa wê dewleta Tirk leşkerên xwe vekişîne û ji rêveberiya wir re bihêle an na çêbû, lê her çû hejmara baregeh û leşkerên xwe zêdetir kir û pergala xwe meclîsa giştî jî di nav de di hemû saziyên wir de bi cih kir. Navê vir jî kir Komara Tirk a Bakûrê Qibrisê. Bi vê dagîrkeriya ku sînor xist nava gelan niştecihên li hember dewleta tirk derdiketin hatin derxistin, dijminatî xistin nava gelên li Qibrisê ku bi sedê salan bi hev re dijiyan.

Piştî 81 salî vê carê jî ji bo Tirkiye neşemite aliyê Rûsyayê destûr dan ku dewleta Tirk di meha Tebaxê ya 2016'an de li ser alîkariya çeteyên OSO Cerablûsê, li pey hev Ezaz û Babê, Idlibê herî dawî jî di sala 2018'an de Efrînê dagîr bike. Eger armanc ne ev be nexwe çima demografî guherandin, fermî walî, qeymaqamên dewleta Tirk hatin tayînkirin, ala Tirk hat daliqandin, di perwerdeya dibistanan de di şûna zimanê erebî de zimanê tirkî perwerde tê dayîn û di avahiyên îdarî û leşkerî de xwe bi cih kirin? Ji bo cîhanê bixapînin jî carna hinek dibistanên bi zimanên erebî reklam dikin.

Vê yekê di 2013'an de xwestin bi destê El-Nûsra ya El Qaîde li Serê Kaniyê bikin, di 2014'an de bi destê DAIŞ'ê li Kobanê bikin, lê bi berxwedana bêhempa ya YPG-YPJê bi civaka xwe re ev vala derketibû. Vê carê jî dewleta Tirk a dagîrker nakokî an jî valatiya di navbera Rûsya û Amerîka de bi kar anî û hem jî xwe da bikaranîn û ev pêvajo da destpêkirin.

Ev hemû berdewamiya Hatayê ne. Niha li Serê Kaniyê û Girê Spî jî heman amadekarî tê kirin.

Eger gelên Sûriye ji vê yekê re nebêjin êdî bes e û hêza xwe nekin yek wê dewleta Tirk wisa bi hêsanî, xwe bixwe ji axa Sûriyê dernekeve û eger du sibe li herêmên dagîrkirî çawa ku di dema Hatayê de kir, qaşo bi meclîsên çeteyan û bi çeteyên hatine veguhistin biçin hilbijartinan û di wan hilbijartinan de biryar bigirin ku tevî dewleta tirk a faşîst bibin.

Em ji bîr nekin ku xislet ango karakterê dewleta Tirk a faşîst wisa hatiye hûnandin. Eger niha tedbîrên pêwîst li dijî dewleta dagîrker ya Tirk nayên girtin, Sûriye ku wek yekbûyî tê xeyalkirin rastî jî yê tenê bibe xeyalek, lê xeyalek pir bi êş û trajîk…



# 'Yekîtiya gelê Kurd wê bibe benda li pêşiya komkujiyan'

Şêniyên bajarê Qamişlo gotin "Yekîtiya gelê Kurd wê bibe bendeke li pêşiya dijminan ku nikaribin komkujiyan bikin" û bang li partiyên kurdî kir ku destê xwe ji destê dijmin derxin.

Di her demê de gelê Kurd banga yekîtiya kurdî dike. Lê hê ti encamên berbiçav nehatine girtin. Lê gelê Kurd ji her demê zêdetir banga yekîtiyê dike. Lewre yekîtiya refên kurdî wê gel ji komkujiyan biparêze.

Selahedîn Helbo şêniyê bajarê Qamişlo ye, der barê pêwîstiya avakirina yekîtiya kurdî de nerîna xwe wiha anî ziman: "Yekîtiya gelê Kurd wê bibe bendavek li pêşiya dijmin ku nikaribe komkujiyan bike. Dema yekîtiyeke kurdî hebe biryareke kurdî hebe wê biştgireyek ji derveyî civaka kurdî jî çêbe. Eger her yek ji me li hêlekê bixebite mixabin wê cihê kêmasiyê be, ew kêmasî ne kêmasîyeke normal e. Bi wê kêmasîyê komkujî tên kirin. Eger em vegerin dîroka Kurdan bi sedan komkujî li ser Kurdan hatine kirin. Mîna, Helebce û Enfalan, sedema van komkujiyan parçebûna gelê Kurd e."


Selahedîn Helbo ev bang kir: "Bi navê kurdîyatiyê, bi navê pêşketinê, bi navê yekîtiyê êdî Kurd dikarin her tiştî bikin. Doza mafên xwe bikin, di heman demê de Kurd derfetê nadin ku polîtîkayên qirêj li ser wan bên meşandn."

Abdullîlah Xelef jî bang li rewşenbîrên Kurd û partiyên siyasî kir ku yekîtiyê çekin û got, em wek gelê Rojava daxwaziya yekitiyê dikin. Eger yekîtî çênebe wê her dem komkujî çêbin. Em bang li partiyên siyasî dikin ku yekîtiyeke kurdî çêkin ji bo bibin xwedî maf. Û divê paartiyên kurdî têkiliyên xwe bi dijminên gelê Kurd re rawestînin. Eger yekîtiya me çênebe wê gelek Helebce çêbin.





## Newroz serkeftina tifaqa gelan e



Mihemed ŞAHÎN

Em di meha Adarê de ne. Meha Adarê meha şehîdan e, meha berxwedanê ye, meha lêheng û pakrewanan e, meha mirina Dehakan û azadiya civakan e, meha Newrozê ye, destpêka biharê û destpêka jiyana nû ye. Lewre meha Adarê ji bo gelê Kurd û gelên bindest meheke gelek girîng û watedar e.

Civaka kurd 2 hezar û 632 sal in, roja 21'ê Adarê cejna Newrozê pîroz dike. Lê cejna Newrozê ne tenê ya civaka Kurd e ya gelên Rojhilata Navî ye, bi taybetî cejna civakên bindest e.

Newroz hem ji bo gelê me û hem jî ji bo gelên bindest, destpêka salê ye. Di destpêka salê de mirov, civak û xweza xwe nû dikin. Pratîka xwe ya sala dawî di ber çavan re derbas dike, şaşî û kêmasiyên xwe dibîne û ji holê radike. Ji bo bigihîje armancên xwe nexweşî û kêmasiyên xwe yên heyî dibîne û xwe ji wan rizgar dike.

Girîngiya xwepaqijkirina ji kirêjiya dîrokê di peyama Sema Yûce de veşartî ye ku yek ji şehîdên Newrozê ye. Beriya ku bibe şehîda Newrozê di nameya xwe de wiha dibêje; 'Ezê tenê mûyeki xiyanetê jî di laşê xwe de nehêlim.' Peyama Sema Yuce ya nemir ji bo gelê Kurd peyameke gelek mezin û girîng e. Rêheval Sema Yuce dizane ku trajediyên kurdan ji ber îxanetan, ji ber 'kurmê darê' pêk hatine. Lewre di peyama xwe de bang li gelê xwe dike ku ruhê xwe bi agirê Newrozê bişûn û xwe ji her cureyê îxanetan rizgar bikin.

Ruhê Newrozê, ruhê azadî û demokrasiyê ye, ruhê serkeftinê ye. Di ruhê Newrozê de berxwedan, serhildan, yekitî û tifaqa neteweyî esas e. Serhildan û berxwdanên Kurdan hemû bi ruhê Newrozê hatine efsûnîkirin. Hemû rêxistin û tevgerên azadiyê li ser hîmê Newrozê hatine avakirin.

Cejna Newrozê ji bo civaka Kurd Kongreya Neteweyî ye, tifaq û hevkariya civakî ye, tifaqa gelan e, berxwedana azadiyê ye, berxwedana li dijî zilm û zordariyan e, li dijî koletiyê serîrakirin e.

Ji ber ku gelê Kurd qadên Newrozan wekî qadên Kongreya Neteweyî dibîne her sal bi hestên neteweyî berê xwe dide wan qadan û daxwaziyên dilê xwe, armancên xwe di wan qadan de tîne ziman û nexşerêya berxwedana xwe ya salane di wan qadan de diyar dike. Ev peyam him ji bo serdest û dagîrkeran e, hem jî ji bo rêxistin û tevgerên Kurdan.

Rêxistin, tevger û pêşengên ku guh bidin daxwaziyên gel û nexşeriya berxwedanê ya ku gel diyar dike esas bigirin ew dibin yên gel. Yên bibin ên gel têkçûna wan êdî ne pêkan e. Tevgera Azadiya Kurd û rêberê wê Birêz Ocalan 40 sal in qadên Newrozan û peyamên gel esas digirin. Ji ber vê yekê ye ku Tevgera Azadiya Kurd û Birêz Ocalan bûne gel bixwe û 40 sal in bênavber bi awayekî herî serkeftî li ber xwe didin.

Di Newrozan de gelek serhildan û berxwedan pêş ketine. Wan serhildanan bandoreke mezin li civaka kurd kiriye û bûne sedemên guherînên gelek mezin ên ku her yek bi qasî şoreşekê girîng in. Di pêşketina hestên neteweyî de, di pêşketina çandê de, di civakbûyînê de, di demokratîkbûyîna civakî de, di azadiya jinê de guherînên ku her yek bi qasî şoreşê girîng in pêk hatine.

Wan şoreşan di civakê de guherînên gelek mezin pêk anîne. Di encama wan şoreşan de civakeke nû û kesayetiyeke nû hatiye afirandin. Ji ber vê yekê ye ku Rêberê Gelê Kurd Ocalan ji civaka Kurd re dibêje "Civaka Newrozê, Gelê serhildanê".

Belê hemû salên Kurdan dijwar û kirîtîk in lê Newroza îsal di rewşeke ji hemû salan dijwartir û krîtîktir de tê pîrozkirin.

Li çar parçayên Kurdistanê li ser Kurdan êrîş hene, siyaseta qirkirinê bê navber berdewam dike, li ser Rêberê Gelê Kurd tecrîdeke mûtleq a hovane ya ku di cîhanê de mînakên wê tine ne tê meşandin. Bi taybetî li Bakur, qirkirina siyasî, kuştin, îşekence, talan û wêrankerî bênavber dewam dike.

Saziyên Kurdan hemû hatine girtin û yên mayî jî yek bi yek tên girtin. Wekîl û şaredarên ku vîna civaka Kurd temsîl dikin yek bi yek tên girtin û cezayên giran ên derhiqûqî li wan tên birîn.

Li Rojava, Efrîn, Serê Kaniyê, Girê Spî, Bab û gelek deverên din hatine dagîrkirin. Li wan deveran jî siyaseta qirkirinê bênavber dewam dike. Bi kurtayî hemû cureyên qirkirinan bi awayekî herî hovane li çar parçeyên Kurdistanê li ser civaka kurd tên meşandin. Bi kurtahî di bin siyaseta qirkirinê ya hovane de em îsal Newrozê pêşwazî dikin.

Newroz, cejna serkeftina tifaqa gelan a li dijî Dehekan e. Li dijî dehakên hemdem îro jî pêdivî bi tifaqa gelan heye. Çawa 2 hezar û 632 sal berê gelan tifaqa xwe pêk anî û Dehakê xwînmij têk birin, îro jî dikarin tifaqa xwe pêk bînin û Dehakên hemdem yek bi yek têk bibin. Ev erkeke mirovî ya hemû kes, sazî, rêxistin û gelan e.

Niha dîsa Newroz ruhê tifaqê dixwaze; yekîtiyê dixwaze, berxwedan û azadiyê dixwaze. Newroza 2020'an ruhê tifaqê, ruhê yektiyê li ser hemû kes û civakan ferz dike. Li ser civaka kurd tifaqa neteweyî, di pêşengiya hêzên demokratîk û sosyalîstan de tifaqa civakan ferz dike. Jêdera Newrozê nîşanî me dide ku têkbirina Dehaqan bi tifaqa gelan pêkan e û gelek hêsan e.

Belê, ji ber tedbîrên tenduristiyê kombûna li qadan hat betalkirin lê ev nayê wê wateyê ku dê kurd dernekevin qadan û Newrozê pîroz nekin. Bervajî hewce ye hemû qad, kolan, tax , gund û her malek bibe qadên Newrozê û bi coşeke herî xurt Newroz were pîrozkirin. Divê hemû kes tev li pîrozbahiyan bibe û helwesta xwe ya li dijî siyaseta qirker nîşan bidin ku rayedarên hikûmeta AKP'ê fêm bikin ku siyaseta wan a qirker tu encam nade.

Hewce ye em ji bîr nekin ku bidawîbûna siyaseta qirker girêdayî helwesta me ye. Lewre hewce ye helwesta me gelek zelal û xurt be. Heke ji hêla civaka kurd ve helwesteke xurt were nîşandan dê rayedarên hikûmeta AKP'ê bibînin ku siyaseta ku li ser Rêberê Gelê Kurd Ocalan dimeşîne, siyaseta qirker a ku li ser çar parçeyên Kurdistanê dimeşîne ji bo wan encameke erênî nade û berovajî hêrs û berteka civaka kurd zêde dike. Wê hikêmeta AKP'ê neçar bimîne ku dest ji wê siyaseta xwe ya qirker û kirêt berde.

Dîrok nîşanî me dide ku, têkoşînên ku bi ruhê Newrozê ve girêdayî li berxwe dane bi ser ketine, rêxistin û tevgerên ku bi ruhê Newrozê ve girêdayî meşiyane biserketine û temenê xwe dirêj kirine. Di wî warî de mînaka herî girîng Tevgera Azadiya Kurd bi xwe ye.

Bêguman ên ku Tevgera Azadiyê anîne vê astê û civaka kurd kiriye 'Civaka Newrozê' kesayetên mezin ên ku bi lêhengiya xwe rêya serkeftinê nîşanî me dane şehîdên Newrozê bi xwe ne. Di şexsê Mezlûm û Egîdên nemir de em hemû şehîdên Newrozê bi rêzdarî bi bîr tînin û bejna xwe li ber lehengiya wan a bêhempa ditewînin.

Bi hêviya ku Newroza îsal bibe Newroza têkbirina siyaseta AKP'ê ya qirker.

Newroz pîroz be...

FENER

### Newroz pêngava serketina têkoşîna gelan e



Idrîs HENAN

Ji bo me Kurdan tevî êşên meha Adarê, bi Newrozê re, bi şoreşa xwezayê li hemberî sermaya zivistan û payîzê, li dijî zalim û koledaran pêngavên şoreşgerî dest pê dikin. Bi biharê re hişînahî zîl vedide û digel karesatên li ser me hêviyên me mezin dibin. Jiyana me her di nava hev de bi rê ve çûye û hatiye vê roja me ya îro. Aliyekî têkoşîna mezinbûnê û aliyê dîtir berxwedana li hemberî hewldanên qirkirinê heye. Bê vehesîn bi sedê salan civaka me wisa derbas kiriye. Bi qasî asta hovîtiya êrîşan bi qasî meşa kêsûyan be jî em li ber xwe didin. Bi Newrozan re jî enerjiya me Kurdan xwe nû dike û têkokşîna azadiyê digihe lûtkeyê.

Diz û talankerên keda mirovahiyê bi hezarê salan e li ser pişta nirxên gelan dinepixin û diwerimin. Bi tez û sentezên fêlbaziyê sîstemên xwe yên xapînok afirandine û bi rêbazên qirker anîne vê roja me ya îro. Her tişta ku çêkirine jî, çawa xwedayan xuliqandibin pêşkêş dikin û wisa bê mînak pênase dikin. Ji bo ku pêngavên dîrokî yên gelan bidizin jî, nirxan û afrîneriyên gelan desteser dikin û serdestiyên bi derewên maskekirî dadimezirînin. Ji bo wê jî sîstemên ku wan maskan li hewa bigirin û ji herifînê biparêzin çêdikin û weke nirx davêjin navarastê.

Jixwe ev rengê serdestiyan pala xwe dide taybetmendiya xwedayan a mutleqbûnê. Ango; bi hiqûqa desthilatdariya çors re exlaqê binpê dikin û defê diqetînin ku piştî wan heram be `mitribek` hebe!. Li ser vê şaneya zanebûna çelûxwar, êrîşî civak û xwezayê dikin. Ekolojiyê weke mal ji xwe re dihesibînin û ji bo qezenca zêde talan û qir dikin. Biharên gelan dikin zivistan û gerdûnê bê demsal dihêlin. Bi gotineke din; agir berdidin derrdorê, ter û hişk pêk ve dişewitînin. Ji bo misogeriya vê şewatê, her li sîstemên xwe rêbaz û taktîkên qirkirinê yên nûjen bar dikin. Jixwe hebûn û nebûna mirovan ne li gorî wan be jî, çênabe?. Ji teşeyên mirov û civakan bigire, heta zayîn û mirinê were desteser kirine. Rêbaza jiyîna mirovatiyê li gorî xwe tayîn kirine û serjimariya ku jê sûdê wergire destnîşan dike, derveyî van bijardeyên xwe her tiştî tarûmar dike. Ti mafê wê yê jiyînê nahêle. Bi teknîkên ji koletiya zanistê hatine afirandin, nexweşiyên biyolojîk, çek û cebilxanê û bi êrîşên derûnî, mirovatiyê dîl digirin û bihara gelan vediguherînin çolistanê. Dixwazin dunya bibe yekdemsal û pirrengiya xwezayî ji holê rakin. Hebûnan bi rengên xwe boyax bikin û vîna jiyînê ji dest bide. Eger wisa bûya, wê zivistan, payîz, bihar û havîn jî nebûna. Wê ne rast û ne çep, ne sar û ne germ hebûna. Wê her jiyan tarî bûya. Ji ber vê dualîteya diyalektîka hebûnê, ew sîstemên qirker nikarin rojan li gorî îradeya xwe tenê diyar bikin. Bi têkoşîna xwezayê û berxwedana îradeya gelan a xwe dispêre qeşengî û enerjiya biharan planên wan têk diçin. Ji ber wê Kurdan her bi Newroza biharan re pêngavên xwe yên dîrokî dest pê kirine û xeta têkoşîna xwe sererast kirine. Taqet û enerjiya hebûnê nû dikin û ji têkoşîna gelan re dibin pêşeng. Newroz starta van pêngavên gelan ên li dijî her cureyê êrîşan e. Bi Newrozan re berxwedana gelan bi ser dikeve.